

# kurdnasîn

Tîrmeh/îlon 2003

Hejmar: 6 Sal: 2

ÇALAKÎYEK ENSTÎUYA KURD YA BRUKSEL



JÎYANEK TENDURIST



PIRSGIRÊKÎN CIWANAN

LI EWROPA Û RÊYA ÇARESERÎ YÊ



SÎNORÎN DI MEJÎYÊN KURDAN DE HATINE  
KİŞANDIN Û HÊVÎYA JI KURDISTANA BAŞÛR



14 DE ROL EN INVLOED VAN ZELFORGANISATIES  
MET BETREKKING TOT  
KUNST EN CULTUUR IN NEDERLAND



INLEIDING;

TOESPRAAK VAN MARTIN VAN BRUIJNESSEN  
FOTOTENTOONSTELLING VAN HASSANKEYF  
OP 17 SEPTEMBER 2003, DEN HAAG



JONGERENUITWISSELING 2003



RÊZIMAN - KIRDAR



HELBEST:  
RÊWÎTÎYEK

## NAVEROK/INHOUD

Kurdnasın organa KOÇ-KAK é ye.  
u ji sê mehan careke derdikeve.  
Kurdnasın is een uitgave van KOÇ-KAK  
Kurdnasın verschijnt 4x per jaar.

**Redaksiyon / Redactie**

B. Baran  
Leyla  
Ferhat

**Xebatkar / Medewerkers**

X. Uso  
Brûsk  
Rojin  
Zelal

**Pergela Rupelan / Grafische Vormgeving**

Şefik  
Mehmet  
Adar

**Navnişana Redaksiyonê / Redactie Adres**

KOÇ-KAK  
Klarendalseweg 468  
6822 GW Arnhem

**Navnişana Postê / Post Adres**

KOÇ-KAK  
Postbus 1092  
6801 BB Arnhem

**E-mail**

kockak@nistiman.com  
redactie@nistiman.com

ÇALAKÎYEK ENSTÎUYA KURD YA BRUKSEL	5
JÎYANEK TENDURIST	7
PIRGIRÊKÎN CIWANAN LI EWROPA Û RÊYA ÇARESERÎ	9
SÎNORÊN DI MEJÎYÊN KURDAN DE HATINE KİŞANDIN Û HÊVÎYA JI KURDISTANA BAŞÛR	11
14 DE ROL EN INVLOED VAN ZELF- ORGANISATIES MET BETrekking tot KUNST EN CULTUUR IN NEDERLAND	13
INLEIDING; TOESPRAAK VAN MARTIN VAN BRUIJNSEN FOTOTENTOONSTELLING VAN HASSANKEYF OP 17 SEPTEMBER 2003, DEN HAAG	17
JONGERENUITWISSELING 2003	20
RÊZIMAN - KIRDAR	22
HELBEST: RÊWÎTİYEK	26



## ÇALAKÎYEK ENSTÎUYA KURD YA BRUKSEL

B.Baran

Îsal Enstituya Kurd ya Brukselê ji bona hînkarî û hevnaşîna ciwanan projek amade kiribûn. Hinek ji ciwanên KOÇ-KAK ê jî besdar bûn. Ez bi xwa jî yek ji çavdêrên ciwanan besdarê vê proja hanê bûm. Ji ber vê jî ez dixwazim lîvir bi hawekgelek kurthinek agadarîli servê çavdêriya xwe bi we repar bikim.

Berya vê piroja hanê ez dixwazim bi hawek gelek kurt Enstituya Kurd ya Brukselê bidim nasîn. Enstituya Kurd avayîyek kurd ya pêşî ye ku li Belçîka hatîye avakirin. Di destpêkên salên 1980 yî de ji alîyê çend kurdêñ welatperwer ve bi navê TÊKOŞER komelek kurd hat ava kîrin.

TÊKOŞER di warê sîyasetê de bi tu rêxistinî ve girêdanê wê tunebû, yanê wek bi civakî dîbêjin; komelek serbixwe bû. Kesêñ amadekar jî ger têkilîya hinek jiwan bi rêxistinan re hebû jî di karê xwe yên komelê de bi hawek pir balkêş û bi berpirsiyarek mezin ve bê alî tevdigerîyan.

Komelê bi navê Têkoşer kovarek jî derdixist. Ev kovar jî li ser bingeha agadarî dayîna rewşa kurd bû. TÊKOŞER ji alîyek ve li gor hêza xwe xebata çandî dikir û ji alî dinjî giranî dîda ser pêwendîyên fermî û nefermî yên derve daku karibe ji bona tevgera kurd feydek bidestxê û ew bi xwe jî bibe cîyê agadarî û têkilîyên navbera civaka kurdû hêzên fermî û yên nefermîyên li Belçîka.

Di wê demê de tengasîyên mezin li pêşîya xebata kurdan hebû. Li Belçîka jî wek gelek deverêñ din yên Ewropa civaka kurd li derveyî xebata rêxistinî bû. Êrisêñ giran ji derveyî civaka kurdû ji nav civaka kurd li ser TÊKOŞER hebûn.

Ji bona Enstituya Kurd karibe xwe biparêze û xebata xwejî firetir bike, pêwistîyek xwurt bi alîkarî hebû. Di wê demê de em bi xwe him wek kesayetî û him wek Komela KOÇ-KAK piştgîrê TÊKOŞERÊ bûn.

Her ku çû xebata têkoşer firetir bû. Têkoşer bû navnîşanek agadarî û pêwendîyê li Belçîka. Ci di warê pirsigirêka civaka Kurdêñ li Belçîka û gi li ser rewşa Kurdistanê agadariyêñ Têkoşer û yek girîng digirt. Lî xebata wê têrnedikir û hêjî divîya firetir be. Me vê rewşê nîqaş kir û em bi hawek gitî gihiştin bawerîyek ku pêwistî bi ENSTITÛ bûyînê heye. Ji xwe TÊKOŞER di fermî de avayîyek navnetewî (Ewropî) bû, Enstitû jî divîya navnetewî be.

Li ser vê rewşê destûr û bernama TÊKOŞER hat guhertin û navê wê bû ENSTÎUYA KURD LI BRUKSEL. Endamêñ me ji gelek welatêñ Ewropa hebûn û her weha niha jî wehaye..

Mixabin her çend xebata Enstituyê pêş ve çû, hinek nexweşî jî di nav Enstituyê de derketin ser ruyê avê. Hinek alozî dinav Enstituyê de rû dan. Seroka Enstîyi mixabin ji ber alozîyêñ hundurî dev ji Enstituyê berda û pêre jî, hinek veqetandinêñ din çê bûn û hinek endamêñ nû hatin nav xebata Enstituyê. Ev bi xwe xweser mijareke, ku rewşa rêxistinîya civaka kurd li Ewropa çawa û di nav çi astengan de dubuhure. Hestêñ civaka me li hember xebata rêxistinî ci ye? Helwesta civaka me, li hemberê xebata rêxistinî çawaye?



Tevî erêni û nehêniyan ve, tevî gelşên ku wê buhurandin Eenstitû di xebata xwe de her ku cû firetir bû, xebata wê geştir bû. Ez hêvidarim ku her ku here xebatê hemû avahîyen kurdan berbipêş herin, karêن wan geştir û bibertir bin. Wek li jor jî min dîyar kir têkilîyên nav me yanê KOÇ-KAK û Enstituya Kurd li Bruksel ê ji avabûniyên xwe û pêve hebûn û ew têkilî berdewam in. Her du avahîyen kurd di gelek xebatê xwe de bihevre xebitîne, çalakîyên hevbeş amade kirine, besdarêن xebatê hev bûne û bidin jî. Îsal jî dibin çarçova xebatek weha de komela KOÇ-KAK besdarê xebata Enstituya Bruksel bû. Her weha van çalakîyên hanê gelek caran ji alîyê KOÇ-KAKê ve jî hatine amade kirin û Enstituya kurd jî besdar dibe. Xebatê weha yên hînkarîyê wê her bêن domainin jî. Ez hêvidarim ku têkilîyên navbera hemî avayîyen kurdan bi hindikayı li Ewropa her ku here baştir û xweştir bibe. Têkilîyên rêxistinêن kurd çend xweş be berjewendîyên wan jî wê baştir bibe û xebata wan jî wê bibertir bibe. Ev fêdekî gelek mezîn e ji bona tevgera azadîya Kurdistanê û fêdeyek gelek mezîn e ji bona xwedî li civaka kurd ya li Ewropa derketin û çareserkirina pirsgirêkên wêye.

Armanca vê çalakîya hanê him hevnaşîna ciwanêن kurd ji gelek welatêن Ewropa û him jî bi semînerêن cuda, cuda zanyarîyek bidin wan ciwanan û fersenda bi hev re niqaşkirina rewşa xwe û welatêن ku lê dijîn bixin ber çavan û ji rewşen ciwanêن kurdan yên cuda tiştek hînbibin.

Carek ji bona ciwanan; demek dirêj li dervayê malê, heta li derveyî welatê ku lê dijî xweser mayin bix we guhertinek mezîn e. Ciwan bi hawek sererast ji devê ciwanêن wek xwe rewşa ciwanan ji welatên cuda dibihîsin. Xwe bi xwe niqaşa rewşa jîyana xwe û jîyana ciwanêن wek xwe dikin. Dostanî û hevaletiyyêن teze peyda dikin. Bi nasîna ciwanêن din xwe jî bêtir nas dikin. Ji alîkî din ve jî li ber hevnaşîn û geryanan bi semînerêن taybet tiştinêن nû jî wer digirin.

Ji bona min van çalakîyên weha bi gelek warî ve şûna hînbûyînîne. Pêwistîya me bi her warî ve bi nasîna civaka xwe he ye. Têkilî bi ciwanan re danîn, bi wan re rewşa wan ya taybet û rewşa ku ew têde dijîn niqaş kirin, ji bona nasîna civakê gelek girîng e. Dibe ku tiştek bi ciwanan hînkirin xweşiyek bide meriv, lê ji wan tişt hînbûn şûna şanazîyek û kêfxweşiyek pê hempa ye. Ji ber ku

ciwan bi çavek din civakê dibînin, ji me cudatir çavdêrî li civakê dikin, gelek tiştên ku em fêm nakin ew dikarin bi hawek asan bi me bidin fêm kirin. Bi vî hawî em bi xwe dikarin têkilîyên cuda bi ciwanan re deynin, wan çêtir fêm bikin da ku bi asanî tevgerêن wan bipejîrinin û wan ji talûke û kortalêن civakî dûr bixin.

Gelek caran ciwan pirsgirêkên xwe yên ku li mala xwe, li derdora xwe nikarin vekin, nîqaş bikin, qencî û xirabîyên civakê ji hev derxin, li deverêن cuda dikarin nîqaş bikin, rewşa civakê bêtir fêm bikin û bidin fêm kirin. Gava ciwan civaka xwe dinasin, jîyan û têkilîyên civaka xwe fêm dikin, bi hawek dikarin dê û bavê xwe jî baş binasin û têkilîyên çêtir bi wan re deynin. Gava ku têkilîyên baş di nav malbatê de hebin pirsgirêkên malbatê bi tevayî û bi hawek taybet jîpirsgirêkên ciwanankêm dibin.

Her çend di honandina çalakîyê de hinek kîmasîyên piçûk jî hebûn, wek cî ji bona çalakîyên weha ne gelek kîrhatîbû, xizmeta deverêneewçend bi rîkûpêk bû. Lî dîsa jî çalakî serketî bû. Ciwanên besdar him firsenda têkilîyan bi hevre dîtin, him gelek deverên balkêşen Belçika dîtin û agadarîyên balkêş jî li ser wan deveran hînbûn. Li gel bernamên çalakîyan ciwan têra xwe gerîyan jî.

Li gor têkilîyên xwe min dît ku ciwan ji vê çalakîya Enstituyê tevî hinek rexnên piçûk kîfxweşbûn. Dînev xebatek weha berfire de hebûna hinek kîmasîyan jî li ber çavan nayê û meriv hîvî dike ku di çalakîyên pêş de wê bêن kîm kirin.



## JÎYANEK TENDURIST

### X. Üso

Di vê serdema şaristanîya hemdem de, welatên ku di warê aborî, çandî û teknolojîk pêjde çûne, bi taybetî welatên Ewropa, endamên civaka xwe hîn ji zaroktî de bi zanîyarî perwerde dîkin. Ev welatana, di warê jîyanek tendurist ya bi zanîyarî roj bi roj geş dibin û pêşve diçin. Helbetpirsgirêka me ne rewşa pêşveçûn û pêşveneçûna van welatan e; pirsgirêka me, di vê serdemê de, şeweya jîyana civata Kurde.

Helbet li Kurdistanê, rewşa jîyanek bi tenduristî zahmet e û mirov di kane bibêje, gelê Kurd bi her warî rewşek xerab dijî: egera vêna jî, Kurdistan bi sê parçeyên xwe ve mêtîngeh e û ji alî métinkaran ve aborîya wê tê talankirin û bi zanîn ji her warî de bi şûnde hatîye/tê hîştin. Ev jî bûye egera ku di gelek waran de mirovên Kurd ne di zanînajîyanek tendurist deye.

Gelek malbat û mirovên Kurd û piranîya biyanîyên din jî, tevlî ku li welatên Ewropa xwediyê hinek îmkanan e, lê bi gumana min bi giranî, guh nadîn tenduristîya xwe û zarokênxwe.

Bi tenduristî jîyan, pîralî ye: bi aheng xwarin û vexwarin; şuştin û veşuştin, piştî her xwarinê firçekirina diranan; rûyên xwe ji Jahr(toksîn), vayrus, mîkrob û bakterîyan parastin: hîyen û sterîzasyon; tevger û lebata ji laş re pêwîst: spor; di warê psîkojîk de, tunebûna pevcûn, lêdan û geremola nav malê; zarok, bi hejmerk li gorî karîbûnê, bi aheng xwedîkirin, perwerdekirin û di dema xwe de anîna dînyayê; li gorî pêwîstîya laş, dan û stendîna kalorî, proteîn, rûn, şekir û vîtamînan, di dema xwe de raketin, ji xew rabûn, çûna destavê; bi pîvan çay, qahwe vexwarin, an dûrî çixare û alkol û madeyên tevizandinê man, jîyanek dirêj û bi tenduristîli pêşîya mirovan vedike.

Îro li dînyayê nexweşîya herî zêde qelewbûn tê dîtin û qelewbûn egerê gelek nexweşîyan e: nexweşîya movikan, ya masûlke û rehan, ya bêhnîkandin û dil û hwd ye.

Bi aheng xwarin û vexwarin, yan xwe xwedîkirin: divê her mirovê gehîstî, berî ku ew yan zarokêñ wî/wê nexweş bikeve, zanibe ku pêwîstîya laşê mirov rojê ji çend litre av, çiqas mîneral, kalorî, vîtamîn, proteîn û şekir heye.

Heger pîvana vana nizanibe, kîmanîya her yekîji vana yadi laşê mirov de, dikane bibe egerê nexweşîyekê. Ji bo ku li gor pêwîstîya laş, mirov bixwe û vexwe, wê gavê divê mirov zanibe di ci xwarin û vexwarinê de, bi ci pîvanê, çiqas kalorî, vîtamîn an madeyên din hene.

Divê her mirov zanibe, mîkrob, bakterî, vayrus ci ne, ji ci çê dibin, bi ci awayî belav dibin û derbasî laşê mirovan dibin. Gelek rûyên ku mirov xwe ji vana biparêze hene: bi zimanê biyanî wek sterîzasyon û dezenfekte têt bi navkirin. Rêya bingehîn paqîjî ye.

Mirovên ku karekî bike, destênen xwe bide tiştên ne paqij, yan biçe destavê û bi avê xwe paqîş bike, heta destê xwe bi madeyekî sterîz neşo, bakterî ji destê wî/wê naçin û piştî destê xwe bide ci, ew bakterî derbasî wir dibin û bi lez zêde dibin, xerabûn û nexweşîyê bi xwe re tînin.



Her dahnê ku mirov xwarinekê buxwe, divê bi misogerî diranên xwe flîce bike, çimkî hurikên xwarinê yên ku di nava diranan dimînin, heta dahnekî din bakterî jê çê dibin; ew bakterîyana, berêberê dibin egerê kurmibûn û xerabûna diranan û piştre dibe egerê nexweşiyê dev, gewrî, behîvokû hwd.

Her berhemên xwarin û vexwarinê ku mirov ji bazar yan ji dikanan bikire, divê mirov li dema bikaranîna wan binere û piştî ku ew berhemana stendin jî, divê balkêş bin ku berîya dema wan biqede, wan bikar bînin. Xwarin û vexwarin, hemû demek wanya bikaranînê hene; ger ku ew dem derbas bibe, ya bakterî jê çêdibe, yan jî kufik(toksîn) davêjê; piranî vana bi çav nayêñ dîtin, lê di laş de dibin egerê jardadayîbûn û gelek nexweşyan.

Ji bo fêkî û şînkahîyan jî ev qaîde derbas dibe: demek tezebûna fêkî û şînkahîyan hey e; heger kufika wan bi çav neyê dîtin jî, çîqas tezebûna wan winda bibe û kevn bibin, ewçend jî vîtamînên wan kêm dibin. Fêkî û şînkahîyêñ bazaran yê erzan jî bi piranî yên dema wan derbasbûne û vîtamînên wankêm bûne.

Çi vêkî û şînkahî, ci jî hemû xwarinê servekirî dibin, divê baş bêñ şuştin, hinek jî divê baş bêñ kelandin. Hema hema hemû şêweyêñ fêkî û şînkahîyan hem di lem û daran de, hem jî gava davêjin búzxanan bi madeyêñ kîmyawî(jahrî) têñ dermankirin; loma divê tu carî bêsuştin û bêqeşartin neyêñ xwarin.

Ji bo tenduristiya mirov piştî xwarin û vexwarinê, tiştê herî girîng tevger û lebat, yanî spor e. ji bo têroksîjen têkeve nava xwînê û bezê bi zerar bihelîne, yan xwînê ji toksînan paqîş bike û bi rîya xwêdanê bavê der, ji bo rehan paqij û zînde bike, yan masûlkan xurt bike, kirina sporê pêwîste.

Katjimêra laş bixwe hey e: ev katjimêr, xwe li gora şêweyê jiyana mirov eyar dike. Birçîbûn û tihbûn, xewhatin û şîyarbûn, destav hatin û hemû pêwîstiyêñ laş, bi katjimêrek bedenê têt eyarkirin û hiskirin.

Tenduristîya mirov ya ramîyarî, psîkolojîk û fizîolojîk, bi vê eyarê re, ji nêzîk ve girêdana wê hey e. Gava mirov di demêñ bêaheng bixwe û vexwe, rakeve û rabe, destava wî/wê bêt û nere, dibe egerê xerabûna katjimêra laş.

Kesêñ ku çixare û madeyêñ tevizandinê bi kar tînîn, an zêdeyî edet alkol, çay û qehwe vedixwin li rastî gelek pirsgirêkên tenduristî û nexweşyan têñ. Dibin egerê zêde qelewbûn, zêde lawazbûn, nexweşiyêñ pişik, kezeb, dil, mahd, rovî û gelek şêweyêñ qansêrê.

Ji bo gehîştina zanîna vana, divê mirov perwerde bibe. Rêyên hînbûnê jî ev in: divê mirov pirtûk û kovarêñ li ser van mijaran bîxwînîn, bernamêyêñ radyo û televîzyonan yê li ser van mijaran gohdarî bikin, yan serî li pîspor û saziyêñ agahdarîya van mijaran bîdin.

Dewletêñ ku gelek biyanî lêdijîn jî, pêwîste ku bi zimanê wan biyanîyan weşan û bernameyêñ pêwîstyêñ di vî warî de biweşîne. Em dizanîn ku li Hollanda bi Erebî û Tirkî weşan têt kirin, lê bi Kurdi tune ye.



## PIRGIRÊKÎN CIWANAN LI EWROPA Û RÊYA ÇARESERÎ

### Xalit

Ji bo ku rewşa her ciwanî ne wek hev e, pirsgirêkên wan jîji hev cuda ye. Lê ez' ê li ser pirsgirêkên gelempêrî bisekinim.

Piranîya pirsgirêkên ciwanan ji rewşa malbatê û ji helwestê dê û bav dest pê dîke.

Berî her tiştû, normên civata Kurd û divatê Ewropa bi gelek awayîji hev cuda ye. Di warê aborî, kulturî, huqûqî, dînî, exlaqî û hwd. pirvekirî ev cudahî xwerê didin.

Malbatên Kurd, bi gelempêrî ji bo pirsgirêkên aborî û rewşen sîyasîya wek karker, yan jî wek penaber hatine Ewropa. Lê çand, hînbûyîn, exlaq û bawerîyê xwejî bi xwe re anîne. Bi piranî dê zarokan tîne û li mal li wan dinêre û bav jî dixebite ku peran qezenc bike.

Lê hinek jî ku zarokên wan yên hûr tune be, dê û bav bi hev re diçê kar. Heta demekê qanûnen pêwîst e ku zarok biçin dibistanê. Loma li mal, dê û bav li gorî çand, zanîn û bawerîya xwe zarokên xwe mezin dikin, lê li dibistanan jî Ewropî, zarokan li gorî fêde, bîr û bawerî û çanda xwe perwerde dikin.

Ewropî giraniya xwe didin ser entegrasyona (kelandina) zarokên biyanîyan ya bi civaka xwe re. Zarokji mezinan hêsanter bi civaka ku tê de mezin dibe ve dikele û dikevehengê.

Dê û bav jî li hember civaka biyanî dikeve hundir xweparastinekê, tevlî hinek guhertinan, bi giranî dl hundir qalikê civata xwe ya ku jê hatiye dijî loma di hundir demê de civata wan jî tê guhertin, lê ew di şûna xwe de dimîne û ji civaka xwe jî bi şûnde dikevin.

Loma daxwaz, lênerîn, bijartin û şêweyê jiyana bav û dê û zaroyan an ciwanan ji hev dûr dikeve. Ev jî di nav wan de dîbe egerên nakokî, pirsgirêk, şer û dûrketinê. Ev rewş, carna bûyerên dramatîk, carna jîyêñ trajîk bi xwe re tîne.

Pêwîstîya her ciwanî ji têkelî, hevaltî û dostanîya ciwanên hemtayênderdora xwe heye. Her ciwan, di tevgera jiyanê de, bi giranî hemtayêndew yênu ku pêwendîya wî bi wan re heye, ji xwe re pîvan û mînak digire dixwaze bi hevalên xwe re di hundirahengê de be ûji alîwan de bêecibandinû rûmetgirtin.

Loma dixwaze şêweyê porê wî/wê, sol, cil û hemû alavêñ karanînê mîna yên hevalên wan be. Mîna her hevalên xwe yên Ewropî, ew jî dixwaze di warê hisî de, ji cinsê hember bibe xwedî heval. Lê ev daxwaz û pêwîstîyen ciwanan, bi lênerîn, bawerî û daxwazên bav û dêyan re li hev nake.

Ji bo ku rewş û mercên têde ne, her çiqas ciwan dixwazin daxwaz û pêwîstîyen xwe bi dê û bavêñ xwe bidin têgehîştin jî, gelek caran dê û bav li wan gohdar nakin, di wan nagehîjin yandaxwazên beradayî dibînin û bi wan re dixeyidin.

Ew ciwan jî dîgehîjin encama ku dê û bavêñ wan ya bêhiş û famkor in, yan jî nezan û paşverû ne. Hinek bav û dê jî, ji kar û pera pê ve tiştekî din nafikirin û qet bi zaroyêñ xwe ve têkeldar nabin, zaroyêñ xwe bera kuçê didin.



Gava ku ew nebînin an nebîhîzin ku zaroyêن wan ci dike, ji wan re ne derd e, lêgava dît an bihîst ku zaroyêن wan ji dervî normên wan tiştek kîr, wê gavê ya wê durûtîyê bikin û şireta li zaroyêن xwe bikin û bêjîn “tişte ku hûn dikin, bila kes nebîhîze”, an jî wê bi şiddet li wan bide û wan ceza bike.

Ev jî dibe egerêن pirsgirêkên psîkolojîk, durûtî, derewkirin, bêşexsîyetî û ji civaka xwe dûrketa ñina wan ciwanan. Hinek ciwan êdî bi temamî ji dê û bav bi dûr dikevin, dilê xwe ji malbat û civata xwe re digire, hinek dixwaze mîna endamekî civaka Ewropî bê dîtin, hinek jî serî li hemberî her normê hildide û di hundir keft û lefta pisgirêkên psîkolojîk li rêyêن xwe û civakê cezakirinê ñigere an dest bi karanîna narkotîkê dikin, anjîqumar, dizî û serserîtîyan dikin.

Ji ber çanda eşîri an feodalî, ji bo malbatên Kurd cudahiya keç û kur jî heye: kur di gelek kiryarân de serbestir e lê keç di tu kiryarêن xwe (yêñ derve û hundir) de ne serbest e û bi temamî di bin kontrolê de ye. Ku law porê xwe çawa kur bike, ci cilî li xwe bike, li ku rabe û rûne, kengî bê mal an neyê, bi kîjan jin û keça Ewropî re bide û bistîne, pir ne xem e, an tê tehamulkirin (daqurtandin) lê evana yek jî ji bo keçan nayê pejirandin û qedexe ne.

Gelek malbat ji bo egerêن cuda ji keç û kurêن xwe re bûk û zaveyan ji welat tîne. Ev jî dibe egerê gelek pirsgirêkan.

Bi piranî law li hember daxwaza malbatê derkeve, pir pirsgirêن mezin çenabe pir pir pêwendîya wî û malbatê ji hev qut dibe. Lê keç bixwaze vî mañî bi kar bîne, gelek caran dibe egerê lêdan û carnajî kuştina wê.

Piştî ku malbatekê dev ji welatê xwe bera da û çû welatekî bîyanî, bixwaze-nexwaze bi rûmetêñ xwe yêñ civakî re jî dikeve hundir biyanîtîyekê. Divê rewşa nû baş binîrxîne, hêz û rastîya xwe di ber çav re derbasbike û piştîre bibe xwedîyê helwestekê.

Rewşa ku zarokêñ wan têde ye, divê baş binîrxîne her daxwaz û kiryara wan girîng bibîne divê bi pirsgirêk û xebata zarokêñ xwe ya di her warî de têkildar bibe. êkêñ xwe bi wan re par bike. Bav û dê, an zaroyêñ ku bixwazin ji netewetî û çanda xwe dûr nekevin û hinek pirs-

girêkêñ di van waran de çareser bikin, divê bi komik, komele û rêxistinêñ civata xwe re di nava pêwendîyêde bin.

Mirov li gorî mercêñ jiyanê dirame (difikire) û tevdigere, gava ku yên tên Ewropa, divê bîzânebi ñina ne dikane li gorî xwe meroêñ Ewropa biguhere û ne jî dikane di her warî de li gorî daxwaza xwe biji.

Loma ger yek bixwaze bawerî, huqûq, çand û edetêñ civaka xwe bîdomîne û zarokêñ xwe jî werê mezin bike, divê ya ji welatê xwe neçi deverek biyanî, yan jî piştî di rewşê gehîş, divê bi lez vegere welatê xwe. Tevlî van rastîyan, yê ku nexwazi ji Ewropa biqete, divê li gorî mercêñ Ewropa xwe eyar bike û tevbîgere.



# SÎNORÊN DI MEJÎYÊN KURDAN DE HATINE KIŞANDIN Û HÊVÎYA JI KURDISTANA BAŞÛR

## X. Uso

Weke ku tê zanînîn, bi peymana Qesra Şêrîn di 1516 an de, Kurdistan ji aî împaratoriyê Osmanî û Safewî hat dagîrkirin û parvekirin; yanî Kurdistan bi darê zorê ji aî du dewletên dagîker bû du parce û li ser erda Kurdistan sînor hat Kişandin û defakto gelê Kurd bû du parce.

Cara dudoyan jî, di 1923 yan bi peymana Lozan'ê, di navbêna Brîtanya, Fransa, Tirkî û Îran de Kurdistan ji nû de hat parvekirin û Kurdistan bû çar parce. Piştî ku bîrîtanya û Flînsa li gorî berjewendîyên xwe li Rojhelatanavîn dewletên bi xwe ve girêdayî ava kîrin û di warê îdarî û leşkerî de vekşîyan, parçeyên Kurdistanê yên di bin dagîriya Fransa de ket bin nîrêdewleta Sûrî û yê di bin dagîriya brîtanya jî, ket bin nîrê dewlata Iraq.

Wan dewletan di warê leşkerî, sîyasî û aborî ji nû de Kurdistan dagîr kîrin; hebûna gelê Kurd ya civakî, çandî û dîrokî încarû qedexe kîrin. Li ser ziman û çanda Kurd, bi awakî sistematîksiyaseta bisavtinê meşandin.

Çi gavê gelê Kurd, li hemberî vê sîyaseta dagîkeran ya rûxandin û tunekirinê derketîye, serî hildaye û dest bi têkoşînê kîrîye, dagîkeran bi dijwarîyek hovîti êrîşî gelê Kurd kîrîne, ew di tevkujî û işkenceyên giran re derbas kîrine, dîl girtine û koçbar kîrine.

Ji bo ku gelê Kurd nikaribe doza mafê xwe bike, carek din serî hilnede û berxwe nede, zivêr bibe û ji taqet bikeve, dagîkeren Tirkî, Iraq, Sûrî û Îran li ser sînorênu ku Kurdistan parce kîrine û gelê Kurd ji hev qetandine, têldirk kişandine, mayin danîne, di ber hevde qereqol û kemînê leşkeran danîne, têkilîyên civakî, çandî û aborî, hevdîtina malbatan û zewaca keç û kurên Kurd qedexe kîrine. Ji bo ku civata Kurd bi temamî bihelîne, navênu Kurdi yên mirovan, gund, bajar û hemû navênu erdnîgarî qedexe kîrine û navênu bi zimanê fermî li wan kîrine. Bi qanûnî û li hemû saziyên fermî, Kurdi qedexe kîrine. Li saziyên fermî, leşkerî û dibistanan yên bi Kurdi axifîne hatine ceza kîrin. Gava ku ev jî têr nedîtine, dest pê kîrine nasnameyên xwe yên fermî ji Kurdan bi şûnde girtine û Kurdi di welatê xwe de wek bîyanî û penaber hatine rîdan; Bi darê zorê erdê Kurdan ji wan hatine stendin, ji mal, gund û warê xwe hatine qewirandin û malbaten netewa serdest yên biyanî li ser ax û av û warê wan hatine bi cîhkîrin. Li cihênu ku gelê Kurd ji nû de serî hildaye jî, zevîyên wan hatine şewitandin, pez û dewarênu wan hatine kuştin û talankîrin, mal û gundênu wan hatine hilşandin û rûxandin û bi darê zorê dîsa koçber bûne.

Dewletên dagîker, li hemberî gelê Kurd, bi awakî profesyonel û sistematîk hertim ketine hundir çalakî û ragihandinek dezenformasyonê: di nexşe, televîzyon, radyo, rojname, kovar û pirtûkên xwe de, bêşâşkirin û bi balkêşî û heta gengazbe, tu carî navê Kurdi û Kurdistan bi kar neanîne û yên bi şâşî an bi zanîn anîbin ser zimanê xwe jî, êrîş kîrinê û ceza kîrine. Ji bo ku weşan û çapemenîya Kurdi qedexe bûye, civata Kurd hertim pêwîstî xwendin û gohdarîkîrina ragihandinê mêtinkaran maye; pêwîstî hatîye hîstîn ku biçe leşkerî û dibistanen mêtinkaran û serî li hemû sazi û dezgehîn mêtinkaran bide.



Ji bo mirovek jîyana xwe ya rojane bidomîne, pêwîst bûye ku nasnameya dewleta mêtinkar ya ku nasnameya wî ya rastî încar dike werbigire. Ji bo ku serî li endamê malbata xwe ya li pişt xeta sînor maye bide û wan bibîne, pêwîst maye ku pasaporta serdestan werbigire.

Fermîtiya dewletê cîhanê jî hebûna welat û gelê Kurd nas nekirîye. Tevlî ku em ji bo azadî û serxwebûna Kurd û Kurdistanê li hemberî mêtinkaran ditêkoşin û wek penaber diçin Kîjan dewleta cîhanê jî, ew dewlet hebûna netewa me bi fermî nas nekirîye û li ser navê nasnameyên wan dewletê mêtinkar me qeyd dikan.

Di warê aborî, siyasi, çandî û perwerdeyî de, dewletê mêtinkar, heta ku gengaz be, civata xwe pêş ve xistine, lê berevacî vêna, bi zanîn civata Kurd bi şûnde dane hîştîn: ev jî dibe egerê ku civata serdest baqil, jîr, zana, medenî û pêşdeşûyî rê bide, lê berevacî vêna, bûye egerê ku civata Kurd jî bêhiş, hov û nezan şanî bide; û zorga kirine ku her Kurdek "ji ber Kurdbûyina xweşerm bike".

Ji bo ku li tu parçeyê Kurdistanê Kurd, wek dewlet ne xwedîyê statuyekê bûn, li Kîjan parçeyî tade, zordarî û qirkirin bi serê Kurdan hatibe, birayêن wan yên li parçeyên din li gor daxwaza xwe nikarîbûne, yan mêtinkaran nehîştine li wan xwedî derkevin. Demek dûdirêj Kurd bi her warî bêxwedî û bêparastin mane.

Piştî vê rewşa ku gelê Kurd tê re derbas bû, hestêن Kuradan yên neteweyî derbêñ mezîn xwarin û qels bûn. Tevlî ku beşekî civata Kurd bi rik û berxwedarî Kurdbûniya xwe parast jî, lê beşekî ji siyaseta mêtinkaran re serî tewand û ji ber Kurdbûniya xwe fedî kir.

Îro Kurdêñ wek karker yan wek penaber çûne dewletên biyanî, gava ku yekî fermî an ne fermî ji yekî Kurd dipirse û dibê; "Tû ji kî derê ye?", dibê; "Ezji Tirkî (Sûrî, Iraq yan Îran) me/im (!)".

Tevlî ku li welatên bîyanî, astenek li ber gotina ku Kurdek bêje; "Ez Kurd im û ez ji Kurdistan im!" tune ye jî, ji ber egerêñ ku me li jor daye xwîyakirin, nabêjin em Kurdin.

Kurdê her parçekî ku behsa Kurdêñ parçekî din dikan, dibêjin; "Kurdê Tirkî an Tirka, Kurdê Sûrî, Kurdê Iraq an Kurdê Îran": Ji xwe daxwaza mêtinkaran ev e ku Kurdê Kurdistan tune be û ji holê rabe, ku doza mafê welatekî û

netewa ku li ser wî welatî dijî neyê kirin û ev nav ji holê rabin û bêt jibîkirin; em jî vê daxwaza mêtinkar û mijokdarêñ xwe pêktînin.

Her hurgelekî li dewletek Ewropa, jê re mafê bi zimanê xwe xwendina zarakan, bi zimanê xwe weşana radîyo û televîzyonê hatîye dan; lê tevlî ku hinek dewletê Ewropa mîna ku mafê bi zimanê dayikê xwendinji hûrgelan re nas kiriye, ji Kurdan re jî naskirîye; lê piranîya malbatêñ Kurd heta îro wek civatek Kurd ne xebitîye ku vî mafî bikar bîne. Ya din jî, hejmara Kurdan ya li Ewropa ne xwanê ye: ji bo ku Kurd, li ser hejmara Tirk, Ereb û Farisan hatine rêdan an xwe rê dane, ne zrokêñ Kurdan dikanin bi zimanê dayika xwe perwerde bîbin û ne jî mafê weşana radyo û televîzyonê ji Kuradan re hatiye naskirin.

Heta ku hinek Kurd di malêñ xwe de jî bi tirkî an bi zimanekî din diaxifin. Piştnavêñ ku dewleta Tirk bi darê zorê li wan kiriye, gelek di derêñ ne pêwîst jî bi şanazî bi kar tînin! Qaşo hinek ji van kesan sîyasetmedarıya Kurdistanî jî dikan.

Weke ku Kurdêñ yek parçeyî di nav xwe de ne xwedîyê yek komele û sazîyên neteweyî û çandî ne, Kurdêñ her parçeyên Kurdistanê jî ji yên parçeyên din cuda li hev dicivin û komeleyên xwe saz dikan. Bi piranî Kurdêñ perçakî ji yên din dûr û biyanî ne. Werê ku peywendîyên hinek "Kurdan" bi civata netewa serdest re, ji birayêñ wanî Kurdêñji parçeyên din, bêtirin. Dikandarêñ Kurdan jî hebe, lê li ba dikandarêñ ji netewa serdest sentek jî erzantir be, diçin ji ba wan qûtêñ xwe dikirin: û kes narame ku ev pere dikevin banka û xezîna dewleta serdest, dibe fişek û birayêñ wan pêtêñ kuştin!!

Meriv dikane bêje giranîya Kurdan li malêñ xwe, ji telewîzyonêñ Kurd û bîyanîyan bêtir, li telewîzyonêñ Tirk, Ereb û Farisan temaşe dikan û di bin bandora çand û îdeolojîya mêtinkarêñ çavşor û zordar diramin û tevdigerin. Tevlî ku navê Kurdî hatiye qedexe kirin, hîna jî gelek Kurd navê tirk, ereb û farisan li zarokêñ xwe dikan.

Wer xwanê ye ku heta kertekê, mêtinkarêñ Kurdistanê di vê sîyaseta xwe ya zordarî û hovîtîyê de serfiraz bûne: mêtinkarêñ bi darê zorê sînorêñ di nava Kurdistanê re kişandine û gelê Kurd di hundir van sînoran hefs kirine, di nava demê de, di "mejîyêñ Kurdan" de jî van xetana bi cîh kirine!!! Ev rewş, encama helandin



û qedandina netewa Kurd bi xwe re tîne! Lewra reng û dînê Kurdan û neteweyê serdest yek in, ji xwe ci çanda me ya ku hey e, serdestan wergirtine, bişaftine û ji xwe re kirine mal, gava ku zimanê me ji bidin ji bîrkirin û me ji hev re biyanî bikin, hebûna me ji ji holê radikin. Ji xwe aborîya me talan dîkin, me xizan û nezan dihêlin, wêgavêdemek dûdirêj em'ê hîn bêñ eciqandin û bi şunde bîmînin. Lê li Kurdistana Başûr ji gelê Kurd re şensekê bû û derîyekî rizgarîyê vebû!

Piştî li Kurdistana Başûr mafê neteweyî hat bidestxistin û gelê Kurd li ser vî parçeyî bû desthelat, di nav hemû Kurdan dehestênetewî bilintir bûye. Rewşa Başûr, di warê neteweyî de, bi gelemeperi ji Kurdan re hêviyek daye afirandin û piştekdayeçêkirin.

Hemû Kurd, êdî Kurdistana Başûr, ji xwe re xwedî û parêzger dibînin. Êdî Kurd, li parçeyê din bi hêztirdikanin li mafê xwe xwedî derkevin û bi serbilindî netewîtiya xwe biparêzin. Di warê weşan û ragihandinê de, avakîrin û peywendîyê dezgeh û saziyênetewî li her çar parçeyê Kurdistanê û navnetewî, geşkirin û belavkirina ziman û çanda Kurd, rolek girîng dide ser milê gelê Kurdistana Başûr.

Mirina netewetîya gelekî, wendakirina mafê jiyana li ser welitekî ye; wendakirina nasnama gelekî ye; gelekî ku bênasname be, mafê azadîya xwe ji wenda dike. Kesê ku ne endamê netewak serbixwe û azad be, ne xwedîyê raman û kesayetîyek azad e ji...



## DE ROL EN INVLOED VAN ZELFORGANISATIES MET BETREKKING TOT KUNST EN CULTUUR IN NEDERLAND

Garip Özcan

De afgelopen jaren zijn er velen veranderingen geweest die duidelijk hun weerslag gehad hebben op het welzijnswerk, met name in het migranten welzijnswerk in Nederland.

De samenleving verandert, mensen maken zich zorgen over maatschappelijke vraagstukken. Ik denk dat organisaties die voor maatschappelijke problemen een bijdrage willen leveren voor oplossingen, dienen derhalve regelmatig na te gaan wat die veranderingen voor hun doelstellingen zijn en de werkwijzen betekenen.

Zoals vele van u weten, dat het tempo van de veranderingen in de samenleving en de toenemende samenhorrigheid "met name sinds 11 september" sterk is gestegen is ook de onderlinge steun en betrokkenheid sterk afgezakt.

De recente internationale ontwikkelingen met name de aangekondigde preventie oorlog door de V.S en haar allianties op Irak, brengen de Koerdische gemeenschap hier in Nederland grote bezorgdheid over gevolgen daarvan. De koerden dreigen het kind van de rekening te worden, Het standpunt van de Nederlandse overheid is wel bekend. Wij zien geen beweging om de mogelijke consequentie, bijvoorbeeld om de nieuwe vluchtingstrom op te vangen.

De "IK" cultuur heeft de "WIJ" denkende cultuur in sterke mate verdrongen. Zodat men dat ook in het echt kan beleven. De cultuur zoals u weet is een manie van leven, een herkenning van een identiteit, een proces, met andere woorden je kunt deze op allerlei manieren definiëren.

Ik denk dat de culturen van verschillende samenlevingen best naast en met elkaar kunnen leven. Voor aankomende generaties zou dit een verrijking kunnen zijn. De universele waarden en normen zouden tevens beter gerespecteerd en gekoesterd worden.

